

# Agahîyên taybet bo kesê dermanbûyî pê DuoResp Spiromax®



**DuoResp®**  
**Spiromax®**  
budesonid / formoterol



# Çima DuoResp Spiromax® bo min hatîye pêşkêş kirin?

DuoResp Spiromax bo çareserîya nexweşîya astim (bêhtengî) û nexweşîya berdewam ya pişikê (COPD) tê bikar anîn. Sedema pêşkêş kirina DuoResp Spiromax ji aliyê doktorê we ji were eve ku alîkarîya we bike li mijara rêveberîya nexweşîyê û bergirî li alozbûna jîyana xwe ya rojane bi sedema derketina nîşaneyên nexweşîyê.

Pêwîste rêjeya dermanê pêşkêş bûyî ji aliyê bijîşkê xwe, heya paş başbûna rewşa xwe jî, bikar bînin. Herwisa, jidil guhdarîya destûra şêweya rast ya bikaranîna dermanê xwe bikin. Eger we helmij heye, dibe hûnê vê ligor destûra bijîşk bidomînin.

# Sedemê tûşî bûn û nîşaneyê astim (bêhtengî) û COPD ê çin e?

Nîşaneyê astim (bêhtengî) û nexweşîya berdewam ya pişikê (chronic obstructive pulmonary disease, COPD) bi sedema werimîna rêka bêhinkêşanê derdikevîn. Tayên kirkirokê, rêyên veguhestina hewa ne bo û ji kezeba we, û lidema werimandinê naziktir dibin û gengaze bi kilîzê teji bin. Di vê rewşê da, pêvajoya asa ya bşhnekêşanê dijar dibe û gengaze hûn yak yan çend nîşaneyên jêr hest pê biken:

- bêhtengî
- xisexisa
- koxîn
- girtîbûna singî.

## **Li DuoResp Spiromax® da du mijarên çalak hene:**

- Budesonide werimîna rêya bêhnekêşanê kêmtir dike û lê pêşgirî dike.
- Formoterol alîkarîya vebûna rêya bêhnekêşanê û başbûna bilez û demdirêja nîşaneya dike.

Kunên hewa

## Şêweya bikaranîna DuoResp Spiromax®



Devparçe

Serpoşê parastinê



Ciyê nivîsa roja vekirina bêstika foilî

Nîşankera dozê

Bijîşk, perestar yan dermansaz liser rewşa bikaranîna DuoResp Spiromax ji were agahîyan dide. Eger hûn bigumanin bipirsin!

## Serpoşa parastinê veke.



Helmijê wisa bigirin daku bera serpoşa parastina devparçeyê bikeve aliyê jêr. Devparçeyê pê çemandina serpoşê bo aliyê jêr, veke. Dema dengê tiqênê tê, nîşan dide ku serpoş bi tevahî vekirîye. Rêjeya ku dibe hûn bêhn biken, jixweber paş vebûna serpoşê, tê hesabandin.

### Nefes berdane

Dibe niha kezeba xwe vala biken. Heya asta ku hûn eciz nebin, nefesa xwe derxînin. Nefesa xwe bi rêya helmijê *nederxînin!*

# Bikaranîna dermanî



Niha devparçeyê bike nava diranê xwe û lêvê xwe bitaqet bêxe ser. Devparçeya helmijê gez nekin. Herwisa, Hişyar bin ku bera kunê hewa pê tilê xwe negirin. Nefesa xwe bi rêya devparçeyê û bi rewşek kûr derxînin.

## Ragirtina bêhnê

Helmijê ji devê xwe veqetîni û bi qasî 10 çirkan yan heya asta ku hûn eciz nebin, nefesa xwe rabigirin.



## Girtin

Hêdî hêdî nefesa xwe derxînin, –lê ne di nava helmijê da–û serpoşa parastina devparçeyê bigirin.

## LI BÎR NEKIN KU:

- Pêş bikar anînê, helmijê nehejînin.
- Pêş bikar anîna helmijê, avê devê xwe vedin.
- Gengaze paş bikaranîna DuoResp Spiromax® hûn hest bi tamedek taybet li devê xwe da bikin. Hesta bi ev tamê tam asa ye û bi sedema hebûna laktoza alîkar e.
- Eger hûn nişkave serpoşê vekin û bigirin bê ku hûn dozê bikar bînin, doza kêrhatî heya dora pêşî ya bikaranînê tê li nav helmijê da bimîne. Lê belê, ager hûn naxwazin helmijê bikar bînin, derê vê neveken ji ber ku her carê ku hûn serpoşê vediken, nişankera rêjeya bikar anînê, yek dozê ji hejmara carê bikar hatî kêmkirî.

# Pilana tedavîya we

Mêjera DuoResp Spiromax<sup>®</sup> ye we pêktê ji:

---

---

---

## Agahîyên pêwendîyê:

Bijîşk/perestar:

---

Jimare ya telefonê:

---

Demjimêrên bersiva telefonê:

---

Dermanê standî DuoResp Spiromax<sup>®</sup> (budesonide/formoterol). Podreya bêhnkişandinê. Dermanê destûrdayî. **Şêwaza bikaranînê:** DuoResp Spiromax bo çareserîya nexweşîya Astim (bêhtengi) û Nexweşîya Kevn û berdewam a girtibûna Pişikê (COPD) tê bikar anîn. DuoResp Spiromax tenê bo kesê ku temenê wan 18 sal yan zêdetir e tê bikaranîn. **Hişyarî û baldarî:** Eger nexweşîyêke din bi te rah eye an dermanekî din bikar tîni, berî bikaranîna DuoResp Spiromax<sup>®</sup>ê digel doxtor, dermansaz an perestara xwe rawêjkariyê bike. Eger tu jîna ducanî an şîrdêr î, guman dikî pêgirani an dixwazi bibî ducanî, divê berî bikaranîna vî dermanî digel doxtor, dermansaz an perestarê xwe rawêjkariyê biki. **Belgeya zanyariyan bi diqet û baldarî bixwîne.** DuoResp Spiromax ji aliyê Teva Sweden AB'ê va, bi navnişaniya Box 1070, SE-251 10 Helsingborg, Sweden tê pêşkêşkirin. Adara [9] 2017'an

SW/RESP/17/0013a